

PAPER DETAILS

TITLE: Bi Nêrîna Rastgirên Tirk ên Radîkal li Tirkîyê Kurd

AUTHORS: Mehmet Emin PURÇAK

PAGES: 121-126

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/1720054>

Bi Nêrîna Rastgirên* Tirk ên Radîkal li Tirkîyê Kurd

Kurds in Turkey From The Perspective of Turkish Radical Rightists

Mehmet Emin PURÇAK**

Koca, B. (2021) "Kürtler Aslında - Uç Sağın Kürtlere Bakışı", İletişim: İstanbul .
Purçak, M. E. (2021). "Bi Nêrîna Rastgirên Tirk ên Radîkal li Tirkîyê Kurd", Nûbihar Akademî, no. 15, p.

Genre/Cure: Book Evaluation/
Nirxandina Pirtûkan

Received/ Hatîn: 19/04/2021

Accepted/ Pejirandin:
21/08/2021

Published/ Weşandin:
27.09.2021

Pages/ Rûpel: 121-126

ORCID:
0000-0003-1875-5842

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website./ Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman ve hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate re hatiye derbaskirin.

Bayram Koca, akademîsyenê e û di Zanîngeha Kilis 7 Aralıkê de dixebite. Teza wî ya doktorayê ku li zanîngeha Hacettepeyê qedandiye, di Adara 2021an de ji aliyê weşanxaneyê İletişimê ve bi navê *Kürtler Aslında - Uç Sağın Kürtlere Bakışı* hat çapkirin. Mijara teza wî bi çavê tevgerên polîtîk ên Tirkîyan pirsgerêka Kurd û Kurdistanê ye. Ji bo vê jî xebata xwe bi salên 1945 û 1980î re sînoyê kiriye. Lê digel vê sînoyê, di beşa encamê de bi kurtasî mijarê heta sala 2020an tîne û bi vî awayî sînoyê lêkolînê heta roja me fireh dike.

Nivîskar berê xwe dide tevgerên siyasî yên navendî, nijadperest, olperest û Tirkperest -Tûranîperestên Tirkîyan û li derdora tîgînên "ewlehî", "nasname" û "pêşketin"ê ramanên tevgerên cuda dişopîne. Pirtûk ji xeynî beşên destpêk û encamê ji pênc beşan pêk tê. Di beşa destpêkê de nivîskar behsa naveroka pirtûkê dike. Di beşa yekem de paşxaneyê dîrokî / siyasî û tîgînê tî vegotin. Dema em bala xwe didin dîroka ku nivîskar pênuşa xwe li ser zîq kiriye, ango salên di navbera 1945 û 1980î, wekî tî zanîn, di wan salan de dinya hema bêje bûye du perçe û di nava du dewletan yan jî du blokan de dabeş bûye: Li aliyekê Amerîkaya ku qasî "dinyaya azad" temsîl dike û welatên bi wê

* Ev peyv miqabilî peyva "sağcı" (ing. rightist) yan jî partiyên rastgir "sağcı partiler" (right-wing parties) hatiye bikaranîn.

** **Dr. Zanîngeha Muş Alparslanê, Fakulteya Fen Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.** / Dr. Muş Alparslan University, Faculty of Arts and Sciences, The Department of Kurdish Language and Literature, epurcak@hotmail.com

re ne, cî digrin. Li alîyê din jî Yekîtiya Komarên Sosyalîstên Sovyet, ango dewletên ku “gerdûneke wekhev” dixwazin cî digrin. Di nava van herdu dewletan û dewletên din ên bi şiklekê ketine binê sîwana van herduyan de piştî şerê cîhanê yê duyem “şerekî sar” (soğuk savaş) heye. Lewre rasterast bi hev re şerekî bi mirovan û çekan pêk nayînin; bêhtir jî alîyê tundiya aborî, propagandayê û pêşbirka çekdariyê ve bi hev re di nava reqabetekê de ne. Tirkiye her çiqas neketibe “şerê cîhanê yê duyem” jî, piştî ku şer qediya, dewletê hêdî hêdî berê xwe da Amerîkayê. Sedemeke vê berê xwe danê jî ew bû ku nûçeyek derbarê xwestina axê ya ji Tirkîyê ji hêla Sovyetê ve belav bû. Ev jî bû sedema ku tirsek bikeve nava rêveberên Tirkîyê û ew jî berê xwe didin Amerîkayê û êdî Tirkiye dibe antêneke Amerîkayê ya li Rojhilata Navîn. Piştî ku ev biryar tê dayîn, di nava siyaseta Tirkîyê de, bi taybetî jî di nava siyaseta partiyên navgîn/merkez, nijadperest û Tûranî de rasterast alîgirîya Amerîkayê tê parastin û Ûrîstana Sovyetan wekî hêza şeytan tê dîtin. Bi vê hişmendiya dijmînane li hemberî Sovyetan, hemû xirabî ji Sovyetan tê zanîn û wekî çavkaniya hemû xirabiyên Tirkîyê û hemû dinyayê tê pênasekirin.

Li Tirkîyê saziya siyaseta her dem xwe li ser propagandaya li dijî hêzekê organîze dike û bi dezenformasyona fermî raya giştî li hemberî wê hêza qaşo “dijmin” sewqî tevgerên dijmînane dike. Ev jî vê îmkânê dide hêzên serdest yan jî hêzên dewletê ku bi rehetî bikarin tevgerên ku mîna wan nafikirin û hişmendiya wan napejirînin ji xwe re bikin dijmin û êrîşî wan bikin. Bayram Koca jî di xebata xwe de bala xwe dide ser tevgerên radîkal ên rastgir di siyaseta Tirkîyê de. Bi taybetî jî li ser çar sernavan dabeşkirinekê dike. Li gor vê kategorîzasyonê, di koma yekem de li ser kesên ku pêşengtiya wan H. Nihal Atsız dike ku Tirkperestên sekuler / Tûranîpererest temsîl dike. Kesên di vê komê de pêşengtiyê dikin, bi gelemperî bi hişmendiya ewlehiyê nêzîkî pirsgerêka Kurd dibin gotine ev pirsgerêk bi serê xwe tune, lê Ûrîs, Amerîkî û Îngilîz jî derva û partî û rêxistinên wekî TÎP (Türkiye İşçi Partisi /Partiya Karkeran a Tirkîyê) û DDKO (Devrimci Doğu Kültür Ocakları / Ocaxên Çandî yên Şoreşger ên Rojhilat) ji hundir ve Kurdan dixin nava pirsgerêkan. Di salên 1950î de vê komê nasnameya Kurdan weke nasnameyeke cuda qebûl nekiriye û ew Tirk hesabandine. Lê piştî salên 1960î gotine ku ji ber kêmasî û xeletiyên rêveberan, tevgerên kurddarêz êdî bûne hêz û wan dest ji înkarkirina nasnameya Kurdan berdane. Lê ji Kurdan xwestine ku ji bo nasnameya xwe û heqê xwe yê din deng dernexin û di nava rêxistinên de cî negrin. Divê Kurd li ser axa Tirkiye desthilatdariya Tirkan bipejirînin û dengê xwe dernexin. Ger bêdeng nemînin û di nava Tirkan de daxwaza mafên cuda bikin, wê demê bi mînak qirkirina Ermenîyan Kurd jî tehdît kirine. Wan li hemberî paşdemayîna erdnigariya Kurdan jî pêşniyareke erênî nekiriye. Lewre li gor wan, Kurd tiral in û ji ber vê jî xizan û belengaz in.

Koma duyem “Bizavên sereke yê netewperest” in ku ev jî bi piranî ji alîgirên partî û rêxistinên wekî Millet Partisi (Partiya Gel-MP), Cumhuriyetçi Köylü Millet Partisi (Partiya Komarparêz Gundî ya Gel - CKMP û paşê dibe MHP), Ülkü Ocak-

larî, Türk Milliyetçiler Derneği, Komünizmle Mücadele Derneği pêk tîn. Li gor vê komê nasnameyeke Kurdan tune. Ew jî Tirk in û hinek hêzên derve û hinek hêzên hundirê welat Kurdan dixapînin û wekî ku ew Tirk nebin, wan didin nas kirin. Ji derve hêzên Êris, Amerîka û Îngilîz; ji hundir jî TÎP, CHP, DDKO Kurdan ji rê derdixin û dixwazin welat parve bikin û qaşo Kurdistaneke azad çêkin. Ev koma nijadperest paşdemayîna Kurdan û erdnigariya wan dipejirîne û ji bo çareserkirina nasnameya Kurdan jî pêşketina aborî pêşniyazdikin. Ango paşdemayîna Kurdan bi sedemên aborî xwestine vebêjin û bi aboriyê jî çareser bikin.

Koma sêyem jî ji “bizavên sereke yên îslamîst” pêk tî. Di nava vê komê de Milli Selamet Partisi (MSP) û Milli Türk Talebe Birliği (MTTB) û Mücadeleciler cî digrin. Partî û tevgerên ku di vê komê de cî digrin jî di çarçoveya ewlehiyê de nêzîkî “pirsgirêka Kurd” bûne. Li gorî wan, ev mesele ji aliyê hêzên derve yên weke Êris, Cihû, Ermenî û Îngilîzan û ji aliyê hêzên hundir ên weke Partiya Karkerên Tirk (TÎP), CHP, DDKO, qewmperest û komunîstan ve hatîye xurtkirin û bi piştgiriya wan mesele geş bûye. Lê bingeha pirsgirêka Kurd jî bi polîtîkayên salên avakirina komara Tirkîyê ve girê didin. Lewre wan salan dûrketina ji misilmantîyê, li Kurdan zilmkirin û paşdehiştina “rojhilat” bûne sedem ku pirsgirêka Kurd derbikeve holê. Li gor vê komê çareseriya pirsgirêkê di Îslamê deye.

Koma çarem jî “îslamîstên radîkal” pêk tî ku di salên 1970an de ji komên îslamî yên “nerm” vediqetin û armanca wan wekî Îran û Afganîstanê pêkanîna şoreşeke îslamî ye. Ev kom, ji ber ku bi perspektîfeke fireh li misilmanên dewletên din jî dinihêre, li ser Kurdên Îran û Iraqê jî difikirin û dibêjen, bi avakirina “dewleta Îslamî” dê herkes wekhev bijî, bi vî awayî jî dê pirsgirêka Kurdan ji çareser bibe. Ji bo vê komê jî Akıncılar Derneği (Komeleya Êrîşkeran) herî zêde derdikeve pêş.

Di pirtûkê de, ev çar kom hatine analîzkirin û ramanên wan ên li ser Kurdan hatine vegotin. Bayram Koca dibêje hemûyan jî koka pirsgirêkê bi dewletên derve re girê dane. Her sê komên pêşîn, Kurd weke Tirk yan jî beşek ji Tirkan hesabandine û weke neteweke din ew qebûl nekirine. Ji bo çareserkirina “pirsgirêkê” jî polîtîkayên tundûtîjiyê parastine. Bi pêşniyazên çareserkirina pirsgirêkên paşdemayîne yên rojhilat, gotine dê pirsgirêk jî ji holê rabe. Her çar koman jî Kurd weke mileteke cuda qebûl nekirine. Ango li Tirkîyê di nava salên 1945 û 1980î de tevgerên nijadperest/Tirkperest jî, yên misilmanên normal û yên radîkal jî mafên Kurdan ê azadiyê nepejirandine. Li hember Kurdan xwe sipartine polîtîkayên înkâr û îmhayê. Li çareseriyê jî li derên din geriyane. Ji ber vê jî ev pirsgirêk çareser nebûye û heta roja me hatiyê û îro jî di nava civakê de û di qada polîtîk de pirsgirêka sereke ye. Têspîten Bayram Koca xebata Barış Ünlü ya bi navê *Türklük Sözleşmesi* (Peymana Tirkayetiye) tîne bîra mirov. Barış Ünlü di vê xebata xwe de dibêje li Tirkîyê di nava civakê de peymanê Tirkayetiye heye. Hûn ji kîjan nijad û bawerîye bin ferq nake, ger hûn li gorî vê peymanê tevbigerin, ji we re gelek tişt hêsan in (Ünlü, 2019: 14-15). Di xebata Bayram Koca de jî em dikarin

bibêjin şopa vê “peymanê” rasterast tê dîtin. Lewre çar komên qaşo ji hev cuda ne, di mijara Kurdan de xwe digihînin heman xalê: Kurd ji aliyê hêzên derva û alîgirên wan ên hundir ve tînin xapandin. Ango nayê hişê wan ku Kurd jî herî kêr qasî wan mirov in; aqil û dilê wan heye; ew jî dikarin bifikirin û ji bona xwe û pêşeroja xwe hewl bidin. Her wiha, wan tenê çareyeke xapînok ji xwe re dîtine û dixwazin vê xapînoka xwe bi Kurdan jî bidin pejirandin: Kurd beşek ji netewa Tirkên in û misilman in; dijminê me jî dixwazin wan cuda bidin nîşandan û hew... Tiştek din a balkêş ew e ku Bayram Koca li ser disekine; gelek kesên ku ji netewa Kurd, Erebi û Lazan in jî di nava van rêxistinên navborî de cî digrin û ew jî li hember înkâr û asîmîlasyonê bêdeng in yan jî vê dipejirînin. Ev rewş, dîsa teoriya “peymana tirkayetiye” tîne bîra mirov.

Bayram Koca di vê xebata xwe de çavkaniyên sereke yê derbareyî mijarê de bi kar anîye û bi kesên ku di nava van rêxistinan de cî girtine re hevpeyvîn kirine. Ev jî girîngiya berhemê zêdetir dike. Xaleke din a girîng jî ev e: Kadroyên ku îro li Tirkîye rêveber in û dewletê dîzayn dikin, xwe dispêrin kadroyên salên piştî 1945î, anga partiya Adnan Menderes. Dîsa têkiliya wan a bi partiyên Necmettin Erbakan re jî li holê ye. Di heman demê de desthilatdariya Tirkîye ya îro, derbareyî pîrsgirêka Kurd de pozîsyona înkâr û îmhayê tercîh kiriye û vê politikaya xwe bi hevkarîya MHPê dimeşîne. Di xebata Bayram Koca dehatiye diyarkirin ku do çawa dijminê sereke yê nijadperest û îslamîstên Tirk komunîzm û Kurd bin, îro ji ber ku bloka Sovyetan ji dewrê derketiye, êdî dijminê sereke ji bo wan partî û rêxistinên Kurd û çepgir in. Di siyaseta Tirkîye de bi pêşengtîya AKP û CHPê du blok derketine holê. Di reaksiyon û tawanbarkirinên van blokan de jî em dibînin ku herî zêde rexne li ser pîrsgirêka Kurd tînin kirin. Di vê xalê de em dikarin bi taybetî li referandûma azadiyê Kurdistanê Başûr û bertekên ku partiyên sereke yê Tirkên dan binîhêrin. Ji lewre dema vê referandûmê de li Tirkîye gelek rewşên bîr û siyasatmedarên oldar û netewperest li hember vê tercîha Kurdan bi dengê û bilind û gef lê xwarinê, îtirazên xwe anînin ziman. Ji van kesan yek Prof. Dr. Hayrettin Karaman bû ku ew, di qada olî û rewşên bîrên oldar ên Tirk de weke kesayetekî muteber tê dîtin. Hayrettin Karaman di rojnameya *Yeni Şafak*ê de di derheqê vê hewldana Kurdan de çend nivîs weşand û bi referansên dîni xwest vê daxwaza Kurdan rexne bike. Ji vana yek di 19 Avrêl 2019an de bi sernavê “Bölünmeye giden yol kapatılmalıdır” (Riya ku diçe veqetîne pêwîst e were girtin) bû. Di vê nivîsa xwe de Karaman, xwe dispêrê fetwayeke Prof. Dr. Abdulkerim Zeydan û daxwaziya Kurdan a azadiyê û referandûmê caîz nabîne. Karaman di nivîsên bi sernavên “Tefrika savunulamaz” (Cudatî nikare were parastin), “Ümmeti birleştirmek farz, bölmek haramdır” (Yekkirina ummetê ferz, parçekirina wê haram e) de jî vê sekna xwe didomîne¹. Bi gotina wî, daxwaza azadiya

1 Ji bo nivîsên Hayrettin Karaman yê di derbarê vê meseleyê de hûn dikarin li beşa çavkaniyan binêrin.

Kurdistanê ji bo misilmanan meseleya parçebûnê ye û ev yek ne caîz e. Lê li aliye din çendîn dewletên Erebi û Tirkî hene û tiştên ku wan dewletan anîne serê Kurdistanê ji li holê ye. Dîsa jî ew dewletên Tirkî û Ereban nebûne nîfaq, lê dema ku Kurd behsa azadiyê dîkin, qaşo xetereya nîfaqê derdikeve holê. Ev mînak nişan dide ku rewşenbîrên Tirkî ên oldar di roja me de jî sekna xwe ya li hember Kurdistanê mafê Kurdistanê neguherandine. Di heman meseleyê de reaksiyona rêvebirîyê jî roj bi roj hişktir bûye. Di dawîyê de jî vê hişkiyê xwe gihandîye wê astê ku ji bo Kurdên Başûr di gotina “Dê nanê xwarinê jî nebînin.”² de xwe daye der. Ne tenê ev, di heman demê de ji wezîfegirtina şaredariyên Kurdistanê û tevkîfîkirina siyasetmedar û kesayetên polîtîkayên Kurdistanê; qirtin û qedexekirina sazîyên Kurdistanê li Tirkîyê û polîtîkayên neyênîyên qeyyûman li hember Kurdî jî vê hişkbûna rêveberiyê û zagonan ya li hember Kurdistanê nişan dide. Dîsa şaredariyên ku di destên partîya desthilatdar de ne jî di xêza hişmendiya fermî de tevdişandin û jî çalakîyên Kurdî û di derbarê Kurdistanê dîr dişekinin. Helbet ev jî pejirandineke bêdeng îfade dike. Wekî tê zanîn, ev hişmendî û bîrdozîyekê temsîl dike û di binê vê sîbanê de gelek kom, komale, terîqat û wakîfên olî û partî û rêxistinên rastgirên îslamî hene. Di heman demê de partiyên mîna MHP, BBP, Vatan Partisi ku bi netewperestîya xwe ve tên naskirin jî hene û heman partî ji xêza Îttihat û Terakkîya dawîya dewleta Osmanîyên tên û xwe digihînin Kemalîstên sekuler û netewperestên oldar. Bi vî awayî em dikarin bibêjin îddîayên xebata Koca di polîtîkayên rojane ya Tirkîyê de jî desthilatdar û xwedîbandor in.

Di xebata Bayram Koca de em dibînin ku di siyaseta Tirkîyê de tevgerên radîkal ên Tirkperest û oldar meseleya Kurd çawa dibînin. Bi vî awayî nivîskar di siyaseta Tirkîyê de ji 1945an heta îro panaromayeke derdixe ber me. Ji bo fêmkirina siyaseta Tirkîyê û bi taybetî jî siyaseta Tirkîyê ya îro, xebateke baş e. Di pirtûkê de tişteke din balkêş jî ew e ku nivîskar derbarê mijara xwe de tespît û tehlîlên baş dike lê tenkît/ rexne pir kêmtir in. Mînak, Bayram Koca ji ber ku koka pîrsgirêkê bi derve ve girê didin rastgirên Tirkî rexne dike lêbelê di encamê de sekna wan bi teoriya komplozê ve rave dike. Di derbarê tirkbûnê yan jî netirkbûna Kurdistanê de fikrên tevgerên ku behsa wan derbas dibe de tesbîtên xwe parve dike lêbelê ev rast in yan xelet in, yan jî bi ya wî ev rast in yan jî xelet in, vê nabêje. Wî dikarî bi argumanên ji çavkanî yan jî pisporên wan mijaran ve rastî yan jî xeletiya îddîayên wan rêxistinên bigotiya. Lêbelê vê nake. Ji ber vê em dikarin bibêjin ku kêmasiya sereke ya xebatê, tunebûnê yan jî kêmbûna rexneyê ye. Nivîskar fikrên xwe yên derbarê îddîayên wan koman de venabêje, rast dibêjin yan jî rast nabêjin, vê şîrove nake. Minak, li gorî ramanên rastgirên Tirkî “komunîzm” û “hebûna Kurdistanê” ji bo hebûna dewletê û tirkayetiye du xetereyên sereke ne. Lêbelê nivîskar li ser vê rasterast perspektîfa xwe kûr nake ka gelo bi rastî

2 Çavkanî: “Erdoğan sert çıktı: Yiyecek etmek bulamayacaklar.”: <https://www.yenisafak.com/video-galeri/gundem/erdogan-cok-sert-cikti-yiyecek-ekmek-bulamayacaklar-2156812> (16.05.2021).

jî ji van herdu hêzan quweteke ewqas mezin an jî aktîf heye ku hebûna dewletê yan jî tirkayetiye têxe xetereyê? Lewre dengên ku wan tevgeran digirtin her dem kêmbûne. Di dema tevkîfata mezin a di sala 1951ê de hejmara komunîstên hatin girtin nedigihîşt dusedî.³ Di hilbijartinan de jî tu caran bi fermî komunîst bi navê xwe û Kurd jî bi navê Kurd û kurdayetiye neketine hilbijartinê û nebûne rêveberê dewletê. Nexwe çawa dikarin ji dewletê re bibin xetereyeke herî mezin? Bersiv di vê xebatê de tune. Welew gelek deng bistînin jî gelo ew ji bo dewletê û Tirkayetiye xetere ne yan na? Bersiva vê pirsê jî di xebatê de nayê dîtin.

Weku me di destpêkê de jî got, nivîskar di beşa encamê de mijara xwe heta roja me tîne. Desthilatdar û rêveberên ku îro dewlet di destê wan de ye bi rabirdûyê wan ve, wan digihîne îro û bi vî awayî jî em di aliyê îdeolojiyê de berdewamiya wan kom û rêxistinên dibînin. Ev jî aliyekî erênî yê pirtûkê ye.

Nivîskar dikaribû piştî vê xebatê di derbareyê xalên ku wî temas nekirine de yan pêşniyazên xwe bigotiya, yan jî di vê mijarê de pêwîst e xebatên çawa bînin kirin, fikr û pêşniyazên xwe bigotiya. Lê Bayram Koca ev jî nekirîye. Dîsa jî em dikarin bibêjin tiştên hatine gotin, ji bo yê nehatine gotin deriyekî vedikin û ev derî li benda xwendevanên jîr û jêhatî ye ku bi wî derî re têkevin hundir û bidin li pey xwendin û lêkolînên kûr û dewlemend.

ÇAVKANÎ

1951 TKP Tevkîfatı – *Esbâb-ı Mucibeli Karar*, BDS Yay., 2000.

Karaman, Hayrettin “Bölünmeye giden yol kapatılmalıdır”: <https://www.yenisafak.com/yazarlar/hayrettin-karaman/bolunmeye-giden-yol-kapatilmalidir-32013> (16.08.2021).

Karaman, Hayrettin, “Tefrika savunulamaz”: <https://www.yenisafak.com/yazarlar/hayrettin-karaman/tefrika-savunulamaz-32157> (16.08.2021).

Karaman, Hayrettin, “Ümmeti birleştirmek farz, bölmek haramdır”: <https://www.yenisafak.com/yazarlar/hayrettin-karaman/ummeti-birletirmek-farz-bolmek-haramdir-32425> (16.08.2021).

Koca, Bayram, *Kürtler Aşında – Uç Sağın Kürtlere Bakışı*, İletişim Yayınları, 2021, İstanbul.

Ünlü, Barış, *Türklük Sözleşmesi*, Dipnot Yayınları, 2019, 7. Baskı, Ankara.

Yeni Şafak, “Erdoğan sert çıktı: Yiyecek ekmek bulamayacaklar.”: <https://www.yenisafak.com/video-galeri/gundem/erdogan-cok-sert-cikti-yiyecek-ekmek-bulamayacaklar-2156812> (16.05.2021).

3 1951 TKP Tevkîfatı – *Esbâb-ı Mucibeli Karar*, BDS Yay., 2000.